DÎWANA PEYVÊ

- **Yildiz Çakar/ Amed**
- **XEMGÎN Ê REMO/ Qamişlo**
- **Roj Mizûrî**
- **Orkeş Brahîm**
- **Siyamend Brahîm**
- **Şîlan Hemo**

Derî

Yildiz Çakar/ Amed

Di navbera derî û dilê xwe de mam te

Li aliyek tu

Di nav dubendiya êşê de mam

Li aliyek derî

Bê demên deman bû qeder di ferhenga dilê min de

Ne destê min ji derî dibû û ne jî ji destên te

Bidawî nebû roj û şevên bê te

Çend payizên sar min germ kir, ji bo her tiliyên te

Niha ji ber mayînên êşên xwe didim kûştin,

Ne derî dev ji min berdida û ne ez ji

Ta ku destê min bigîhîje te.

Bêsînor bû sînorên reşika çavên te,

Li wir parçeyek ji te digerim, da ku dilê xwe pîne bikim!

Li ber derî bûm û ez evînbûm

Li ber te sekinandîbûm. De bibêje lo!

Ji çi ditirsî? Ji min an ji agirê dilê min?

Her ku dizivîrîm û li te dinêhêrtim

Şikestinek ava dibû di destê min de,

Destê min li derî asê bûbû, tu li dilê min

Evîn şeveke şevatok bû di dilê min de

Ez lavayek bi gazinç bûm li ber deriyê te,

Ne derî û ne ez me li hev nekir!

Pirayek li ser dojehê bû navbera min û derî

Tirseke zarokane/ Reveke bêwate bû,

Her tîlîkên te janek û golkek agir bû

Gelo kîjan aliyê derî bihûşta dil bû?

-I-

Hatina min a dinyayê ez tenê bûm û tu jî

Çûyina min a dinyayê jî tenê ye û ya te jî

-II-

Gelo di turika te de niha çi hene,

ji bilî kulmeke ax û kevirekî sipî?

-III-

Seyrê herî xweş bû navê te,

Bi bablisokek belawela bû porên reş li ser te

Wek meyê bû her rojên temenê te / min her rojên te vedixwar

Bi evdalê zeynikê, Mem û Siyabend re.

Dizanim tu ji wek min û derî sûcdar e ,

Bêdengiya firtonê bû hembêza te, ez ji darake xeşim

Niha pêlên xwe, êşên xwe diweşinim li ber deriyê te

Deriyên ku ji bo careke din li min vebe.

Amed-2007